## Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê (DAANES)

Di pêvajoya pevçûnên bi navê Bihara Erebî de, rejîma Esed di tîrmeha 2012an de piştî xwepêşandanên girseyî yên gelên heremê, ji herêma bakurê Sûriyê ku bi piranî Kurd lê dijîn vekişiya. Gel bi beşdariya hemû hêzên etnîkî, olî û civakî li herêmê rêveberiya xweseriya demokratîk ava kir. Her wiha neçar man ku şerê DAIŞ'ê jî bikin. Piştî rizgarkirina bajar û herêmên dawî ji destê rêxistina DAIŞê, ev bajarên rizgarkirî jî tevlî herêma Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn, ku niha sêyeka(ji sê bara,barek) herêma Sûriyê dihewîne.

Civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser bingeheke demokratîk hatiye birêxistinkirin, maf û beşdariya jinan di hemû astan de misoger dike, di heman demê de civakeke hawirdorparêz e û nimûneya siyaseta aştiyê ya gelên herêmê ye..

## Şerê hêdî û ambargo

Modêla siyaseta aştiyê ji her alî ve di bin metirsîn û gefan (tehdîdê) de ye. Dewleta Tirk gelek caran bi Droh-neyan (firokeyên bêfirokevan), hawin, tank û mûşekan (rokêtan) êrîşî Rêveberiya Xweser dike û di salên borî de (2016 - 2018 - 2019 ) bi awayekî eşker yesa û zagonên navnetewî bibpêkir û herêmên berfireh li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir kir û gefên dagirkeriyê yên din jî tê xwarin ku herêmin din jî binpêk bike. Ev yek dibe sedema belavkirina tirs û terorê li herêmê ku berê jî tûşî terora DAIŞê bibû û bi vî hawî xelkên heremê careke din berê xwe bidin revek nû û koçkirinek nû. Her wiha rêjîma Esed jî dixwaze careke din desthilatdariya xwe ya otorîter li ser bakur û rojhilatê Sûriyê berfireh bike. Her wiha ambargo û astengkirina aborî û siyasî ya ku ji hêla welatên cîran ve û Yekîtiya Ewropî û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ve dibe sedema kêmbûna alav û kelûmelên girîng û alîkariyên taybet ji bo nûavakirinê, ku dibe sedema zêdebûna êş û azarên xelkê.

Ev faktorên siyasî xebatên Weqfa Jinan diyar dikin, ji ber ku armanca Waqfê ew e ku piştgirî bide gelên ku bi gefên mezin re rû bi rû ye û li kêleka wan raweste. Pêşkêşkirina alîkariyên berbiçav ji wan re û beşdarkirin û tevlêbûna wan ji aramiya jiyana rojane re.

## Komîteya Ewropayê ya WJAS

Em komek piçûk a jinên Alman û Kurd in, ev demek dirêjre ku hinek ji me di nav pêkhateyên navneteweyî de çalak in. Em bi Weqfa Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re herdem di nava têkiliyan de ne û bi awayekî aktîf piştgiriyê didin xebatên wan ên cuda. Bi armanca xurtkirina rola jinan di geşepêdan û pêşxistina siyasî û civakî de, em xebatên wan parevedikn. Di riya çalakî û pêşangeh û platformên medyayê de, em li ser pêşketin û projeyên ku hene agahiyan didin. Em saziyek ji hêza jinanî xurt pêk tên, lê em bê pere ne, ji lewra em alîkariyê ji bo fînanse-kirina projeyên me yên cihêreng kom dikin. Fînansekirina projeyên cûrbecûr bi giranî bi alîkariya madî û bexşandinan pêk tê. Armanca bingehîn avakirina kooperatîfên plansaz-kirî ye, ta xebatên perwerdehî û tenduristiyê yên Weqfa Jinan bi awayekî domdar ewle bikin. Ji ber enflasyon û astengkirina aborî û ambargoyê niha karsazî hêdî dimeşe.

**Bi bexşîna xwe û diyariya madî piştgirî bidin xebata me!**

## Hesabê bexşînê (alîkariyê)

Kurdistanhilfe e.V., Hamburg/Deutschland
Keyword: **WJAS**
Hamburger Sparkasse
IBAN: DE40 2005 0550 1049 2227 04
BIC: HASPADEHHXX

Bexş û alîkarî li Almanyayê ji bacê tê daxistin.
Ji kerema xwe re sernav zelal diyar bikin!

## Navnîşan li Almanya:

**Europakomitee der Frauenstiftung Nord- und Ostsyrien**
c/o Club Voltaire
Kleine Hochstraße 5
D-60313 Frankfurt am Main

**Weqfa Jina Azad a Sûrî**
**Navnîşan li Sûriyê: Weqfa Jina Azad a Sûrî**
Hililiye / Qamishlo, Sûriye
**Malper:** www.wjas.org
**Mail (Ewropa):** info@wjas.org
**Facebook:** facebook.de/WJASInternational
**Instagram:** instagram.com/wjas_int

# Weqfa jina azad a Sûrî

# Xebatên pêşxistina jinan di Rêveberya Xweseriya Demokratîk de li Bakur- û Rojhilatê Sûriyê/Rojava



# Qadên xebatê:

## Weqfa jina azad a Sûrî (WJAS)

Di sala 2014 an de WJAS ji hêla jinên Kurd û Ereb ve hate damezrandin. WJAS saziyek civakî serbixwe ye, li Bakur Rojhilatê Suriye Xebatên xwe dike. Bi armanca xweseriya jinan û rewşa jiyana wan li pêşkevin, xebatên zanîn, tenduristî, perwerdeyî û aborî pêşkêş dike. Bingeha kar û xebatên saziyê li ser lêkolîn û pêşniyazên jinan li tar û gund û kampan organîze dibe. Weqf jibo berfirehkirina pirogramên perwerderiyê û derfetên karan biafrîne hewldanên xwe zêde dike. Di vê çarçoveyê de Weqf hewl dide ku di navbera hemû komên etnîkî û olên cuda de û di nava pêkahatiyên xwe de jî hevkariyeke hevbeş pêk bîne. Nêzîkî 150 xebatkarên rêxistinê hene, navendên perwerdehiyê diparêzin. Li Qamişlo, Kirkê Ligê, Dêrik, Cîl Axa, Hesekê, Derbisiyê, Reqa, Tebqa, Kobanî, Minbic û Sarînê û li kampên El-Hawl, Roj, Waşokanî û Mehmûdiyê kar dikin.

Qadên xebatên rêxistinê pir cihêreng in û bi nermî li gorî rastî û rewşa heremê diguncînin.

Wekî din, karmend bi domdarî têne perwerde kirin, mînak; ka meriv çawa kare bi trawmaya psîkolojîk re mijûl bibe û xwe jê biparêze, da ku ew di bin şert û mercên dijwar de baş û bi ewlehî bixebitin.

Her wiha Weqf di gelek komîteyên gel ên Rêveberiya xweser de cih digire û têkiliya xwe bi komîteyên cuda re berdewam dike, hevkariyê bi desthilatdarên herêmî, saziyên civakî û bijîjkî yên herêmî û rêxistinên hevkariyê yên Ewropî yên cihêreng re dike.




### Zanyarî

- Dersên li ser pirsgirêkên civakî, dîrok, çand û ekolojî
- Kursên fêrbûna xwendinê
- Kursên ziman (Erebî, Îngilîzî, Kurdî)





- Kursên PC (computer)
- Kursên muzîkê
- Kursên werziş

### Pedagojî

- Li Kobanê sêwîxane û bexçê zarokan
- Berdewam perwerdekirna jibo perwerdekaran
- Bexçeyê zarokan li Qamişlo, ji bo zarokên xebatkarên weqfê





### Perwerde/alîkarî ji bo ewlekirina debara jiyanê

- Dirûtin
- Tevjenî, (karê bi ttayê rês)
- Karê berber î (por çêkirin)
- Karê hunerî û karê destan
- Alîkariya bijîşkî



- Firoştgeha berhemên atolyeya dirûtinê li Qamişlo



- Ji her beşî re dîplomatek (bawername) tê dayîn

### Afrandina derfetên kar

- Atolyeyên dirûtinê
- Dermankirina kozmetîkê ya lîzerê

### Tenduristî

- Klînîkek gerok li Derrikê ji bo lênêrîna rûniştevanên gundan
- Li Kobanê Navenda Tenduristiya Zarokan a Lorenzo Orsetti û Navenda lênêrîna jineolojiyê
- Çend klînîkên bi navê Arî: li gelek devran bi lênêrîna tenduristiyê ya bingehîn (belaş) ji bo jin û zarokan radibe
- Navendên dermankirina xwezayî û fizîkî (dermankirin û perwerdekirin) li Hesekê û Dirbêsiyê
- Kurs û dersên li ser jineolojî, nexweşiyên zarokan, nexweşiyên giştî û alîkariya destpêkê





### Pêşniyarên li kampên penaberan

- Xebatên ji nû ve civakîkirina endamên DAIŞ'ê yên girtî
- Kursên din ên perwerdeyê yên li ser mijarên cihêreng, di nav de nexweşî û terapiya laşî
- Perwerdekirina dirûtinê
- Xebata bi zarokan re

### Têkilî û xebatên komîteyan/ temsîlkirina berjewendiyên jinan:

- Li Komîteya Tenduristiyê
- Li micilisa rêveberiya dibistanê
- Di Meclîsa Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de
- Di Komîteya Yasayî de
- Li civata parlementoya herêmê





### Bêtir

- Pirtûkxane li Qamişlo û Kobanê
- Amadekirina parkên giştî ji bo jinan